



Molêr (1622 1673 z.)

(Molière)



Wergêran ji Farsî: Şivan Qasim Hesên

Zankoya Zaxo/ Fakoltîya Zanistên Mirovayetî

Skola Zimanan/ Pişka Zimanê Kurdî



Jan Babtîst Poklîn, yê bernîyas bi Molêr, li pazdeyê meha kanûna dûyê, ya sala (1622 z.) li bajêrê Parêse ji daykbû. babê wî, yê mijûlî karê bazirganîyê bû û li derbarê Loyê sêzdê, weko kelupel firoşê paşayî, hatin û çûn dikir.

Salên zarokîniya Molêrî li Parêse borîn. jîyê wî deh sal bûn, ko dayka xo ji dest da. di sinêlîya xo da, sereray wê çendê, ko mijûlî xwandinê bû, herweha li cem babê xo kar dikir. ji wî jî dihate çaverêkirin, ew jî weko babê xo bazirganîyê bikete pîşeya xo. despêkê ji bo xwandinê, ew hinartine qutabxana Klêrmont û xwandina xo ya seretayî li wêrê xwand, piştî hingê, çû qutabxana mafan û di wergirtina bawernamê di vê pisporîyê da yê serkevtî bû. bo demekê birîyar da, ko li dwîv pîşeya babê xo biçît, ji ber vê çendê di koçka paşatîyê da karek bi dest wî kevt û bû xizmetkarê taybetîyê derbarê "Loîy". her di wan rojan da, bi rêka hevalên xo, hevinîyasîn li gel şanoyê peydakir: bi taybetî hevinîyasîna wî li gel xuwişkên "Bîjart", ko li wî serdemî girûpeka zarvekerên biçûk pêkîna bûn, rewta jîyana wî gohart. şîyan û lêhatûyîya tijî û hêza dahênanê, bûne eger, ko Molêr şanoyê weko cîgehê xo yê rast û dirust bibînît û piştî destberdanê ji pîşeya bazirganîyê, di jîyê bîst



û êk salîyê da, di nameyekê da, daxwaz ji babê xo kir, ew tiştê weko mîrat ji layê dayka wî bicih mayî, bidete wî, ta ko bi pareyê wê li gel çend hevalekên xo, temaşexaneyekê dabmezrînît.

Girûpa Bîjart, piştî gehiştina Molêrî bi wan û rêxstina pirogiramên nû, navê xo bo "girûpa şanoya navdar" gohart.

Despêka karê vê girûpê ya hevdem bû li gel dijwarî û arîşeyan û êkemîn nwandina şanoya vê girûpê, jilayê temaşevanan ve pêşewazî lê nehate kirin. mezaxtinên damezrandina temaşexanê, Molêr deyndar kir û bo demekê girftarî dadgehê û zîndanî bû, lê belê arîşe û girftarî neşîyan kartêkirinê li birîyara wî biken.

Molêr li gel girûpa xo, dest bi wexerê kirin û bo maweyê dwazde salan, li bajêrên coraucorên Ferensa, berhemên xo ji bo xelkî pêşkêşkirin. Molêr her ji desipêka hevkarîya xo li gel girûpa Bîjart, bû şeyda û evîndarê (Madilîn Bîjart)ê û di encam da, ev peywendîye bû egerê zewcînê û ew her dû bûne hevalên jîyanê û hogirên pîşeya hevdû.

Li sala (1658 z.), demê, ko sîh û şeş buhar ji jîyana wî diborîn, bi navudengî û serboreka dewlemend, careka dî hate bajêrê Parêse ve. şanonameya "nojdarê revîayî", ji



êkemîn berhemên wî li bajêrê Lîonê hate nimayşkirin. her beraurd li gel wan rojan, Molêr li hola Luvêra Parêse, şanonameya "nîkomîd", ya kurnî, pêşkêşkir.

Her çi qas navdengî û serkevtina Molêr pitir lê dihat, zikreş û dujminên wî, ko hedar û şîyana rexineyên pênûsê wî nebûn û ji alîyekê din, berjewendî yên wan dikevtine metirsîyê da, zêdetir dibûn. di nava wan hevrkan da, kesên weko pîşekar, rexinegir, qeşe, zengînên nû, rîbaxwar û herweha hindêk ji maqûl û derbarîyan berçav dikevtin. Lê belê dostanî û piştevanîya Loyê çardê, şahê cehêlê Ferensa, ji bo Molêr û herweha jî hevinîyasîna wî li gel Lafontên, nivîserê bernîyas û hevçerxê xo, ev şîyane dida wî, ko hevrkî yê li gel hevdijên xo biket û ji bo bersvdanê bo her êk ji wana, berhemekê biefînît.

"nojdarê evîndar" li sala (1658 z.), "tiranepêkirinên pirbuha" li sala (1658 z.), "qutabxana hevjinan mêran", "qutabxana jinan" li sala (1662 z.) vî berhemî navudengyeka mezin bo Molêrî dirustkir û kojmê hizar Firangan, weko xelat di bin navunîşanê hozanivanê jêhatîyê komîdî, bûne behra wî "jurij dandin" ya "hevjinê aşopî" li sala (1660 z.), "tartûf" li hola wêrsay hate nwandin, lê belê



piştî borîna pênc şevan, rêk ji nwandina wê hate girtin, ji ber wê çendê, ko li dîwana paşay dayka wî toş û pê nexoş bibû. û "şûkirina bi xortî". li sala (1665 z.), şanonameya "don jiwan" bo maweyê pazde şevan hate nwindin, lê belê bi egerê dijayetîkirina Osqufê Parêsê li gel wê, bi şeweyekê neçaverêkirî nwandina wê hate rawestandin.

Her di wê salê da, Molêr bo postê berpîrsîyarê şanoyên girûpa şahane ya koçkê hate helbijardin. "Mîzantiropê" yan "dûre perêz" li sala (1666 z.), "nojdarê neçarî" li sala (1666 z.), "Amfîtirîon" li sala (1668 z.), "qels", "bajêrîyê maqûl" li sala (1669 z.), "find û fêlên îskapn", "sganarîl", "jinên zana", "nexoşê aşopî" û "evîndarên bi gazinde" ji berhemên dîtirên wî ne.

Ji bo demekê jîyana taybetî ya Molêrî, toşî qeyran bû û ji hevjiña xo Madilîn Bîjartê cuda bû û li gel Armando Bîjartê, xoşka Madilînê, ko bîst û êk salan ji wê biçûktir bû, zewcî. Molêr li gel Armandoyê jî hest bi bextewerîyê nedikir.

Ji alîyê din Jan Rasîn, nivîserê bernîyasê hevçerxê wî, ko li gel Molêrî peywendî yên hevalînîyê hebûn, beruvajî çaverêkirina wî, berhemên xo ji bo nwindinê dane girûpa hevrka Molêrî. evan herçende, ko gîyanê Molêrî nexoş kirin,



lê belê ew bê hîvî nekir û wî her berdewamî bi rêka xo da. dûmahîk berhemê wî bi navê "nexoşê aşopî", li meha şubata sala (1673 z.), li (Palays Royal)ê çû ser depê şanoyê û serkevtineka bê wêne bi destxist. di çaremîn şeva pêşkêşkirina vî berhemî da, di demekê da, ko wî bixorolê "Argan"î digêra, jinişkekê ve toşî hêrşekê bû û piştî gelek xwîn helavêtî, ew birin û nivandin, lê belê ew çî caran ji wî cihî nerabûve û her di wê şevê da, xatira xo ji vê cîhanê xwast.

Molêr di şanonameya bernîyasa xo, "qels" da, ji zimanê kesayetîyekê xo bi vî rengî dipeyvît: "her çende jîyana min li gel xoşî û nexoşîyan ya hevrî bûye, lê belê min xo herdem bextewer dîtîye û evroke, ko ez yê di bin givaştineka dijwar û derd û rencan da, yê şkestî me, bêy hindê, ko bikarm palê xo bideme hîç êk ji xoşî û çêjên jîyana xo, wesa dibînim ko pêdivîye qadê bicih bihêlm."

Wîl Dîurant di pertûka "dîroka şarstanîyetê" da, Molêr bi vî şewey pênase diket: "Molêr weko êk ji geştirîn ruxsarên şanoyê dihête hejmartin. di berhemên wî da, ew tiştê, ko bi taybetî bala xwandevanî bo layê xo radikêşt, amajeyên felsefî û daşorînên tûndutîj û trane û henekên



şîrînên wanin. ev berheme di bnîyat û pêkhata xo da, li ser binemayê felsefeya hişmendyê xoragir bûn, ko bi rastîyê di naveroka xo da cihê pesenda hizirvanên sedsala hejdê bûn".

Molêr bi hewl û têkoşîneka mandûnenîyasane bi hizirên nû û bi evîn û heyecaneka êkcar mezin, herdem pwîte bi şanoyê da û hewlda bi hatin û çûna xo bo ser depê şanoyê, hevpeyvîna li gel zarvekeran û berpîrsên şanoyê li demê rahênanê, gelek serboran bidest xove bînît û pêkol dikir, hemû ewa, ko hizir dikir û fêr dibû bi têgehiştineka kûr û hozanvanane nîyasî bûye û bînîte ser depê şanoyê. wî bi ter û tazeyî û sakarîyê, hindê komîdî efrandin ko di wan da, layenên rexnegirane yên gelek bihêz berçav dibin.

Di hebûna Molêrî da bi tinê layenê nivîserî ya wî nîne, ko girêdayî bi dîroka Ferensayê bît, belko kesayetîya vî zalamî bixoye, ko weko pişkek ji paşmaueya kulturî ya welatê Ferensa dihête hejmartin. heman rêveberê şanoyê bi wefa û nexoşî û kul û keder dîtî, heman hevjinê fêl lê bûyî û merd, heman şanonamenivîsê, ko xemgînîya derûnî di bin kenîyê ruxsarê da dinxêvît yan heman zarvekerê xudan derdmendê, têkoşîna xo li dijî xonwandinê (xo bi têgehiştî



danan), demargîrîya ayînî, çîvanok û kevneperstî û dûrîtîyê,
heta dûmahîk bîstk berdewamî pêday.

Jêder:

- درام نویسان جهان، ترجمه و تألیف: منصور خلج، جلد یکم، چاپ اول،
چاپ و صحافی: شرکت سهامی افست، انتشارات سوره مهر (وابسته به
حوزه هنری)، تهران، ۱۳۸۷، صفحات: ۱۱۸ - ۱۲۴.